Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1161 | 17-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Temenê wî biçûk e lê hêviyên wî mezin in



Salar Omerî ji amûrên kehrebeyê peykerên biçûk çêdike û hêvî dike ku bibe dahêner.

Salar Omerî ê 14 salî, ji navçeya Amûdê ya kantona Cizîrê ye. Hêvî dike ku bibe dahênerekî navdar û tiştên pêwîst ji civaka xwe re biafirîne.

Ji 7 saliya xwe ve Salar peykerên biçûk ên patozan, erebeyan û amûrên kehrebeyê çêdikirin.

Peykerên xwe ji karton û plastîkan çêdike û her wiha dixebitin. Salar, carekê bermahiyên plastîk ên biçûk kom kirin û jê têkilkerek fêkiyan çêkir. Her wiha ji parçeyek plastîk û jeneratorên kehrebeyê yên biçûk, fanek çêkir.

Sedemên hiştine Salar wisa afirîner be, dê û bavê wî ne. Lê teşwîqkirin têrê nake, ji ber ku alavên pêwîst ji Salar re kêm in. Salarê biçûk hêvî dike di siberojekê de bibe dahênerek û amûrên nû çêke.

Li gel nebûna piştgiriyê û teşwîqê ji aliyên têkildar ve jî Salar mînaka gelek zarokan e ku siberojeke geş hêvî dikin.

# Di nav rêgirî û êrişan de bi ava hinaran debara xwe dike

**Sînam Hebeş a Efrînê ku piştî dagirkeriya dewleta Tirk neçar ma koçî Şehbayê bike û niha di bin rêgiriya hikumeta Şamê de dijî bi malbata xwe re bi çêkirina ava hinaran debara xwe dike.**



Sînam Hebeş a Efrînê piştî dagirkeriya dewleta Tirk a 2018'an neçar ma koçî Şehbayê bike. Sînam Hebeş niha di bin rêgiriya hikumeta Şamê de dijî bi malbata xwe re bi çêkirina ava hinaran debara xwe dike. Sînam Hebeş li gundê Ziyaretê yê navçeya Şêrewayê bi malbata xwe re her sal ava hinaran bi destan amade dikin. Sînamê dibêje ku ava hinaran ji bo gelek nexweşiyan bi sûd e.

**'Bi ava hinaran debara xwe dikin'**

Sînam Hebeş behsa şêwazên çêkirina ava hinaran kir û wiha got: "Di demsala payîzê de em hinaran dikirin û ava wan derdixin. Em destpêkê hinaran diguvêşin û avê ji wan derdixin. Piştre em ava wan dikelînin heya ku çêdibe. Em her sal ava hinaran çêdikin û bi firotina wê debara xwe li warên koçberiyê dikin. Her wiha em kevnşopiyên xwe jî diparêzin. Çêkirina avê em ji dapîrên xwe hîn bûne."

**'Ji ava hinaran gelek sûd tê girtin'**

Di dawiyê de Sînam Hebeş teqez kir ku ava hinaran ji bo dermankirina gelek nexweşiyan bi sûd e û wiha anî ziman: "Mirov dikare gelek sûdê ji ava hinaran bigre. Ji bo nexweşiyan gelek baş e. Di heman demê de di xwarinan de jî tê bikaranîn û tama wê gelek xweş e. Cîran li me dicivin û alîkariya me dikin, em rojên xwe bi kêfxweşî û hezkirin derbas dikin. Her wiha me her sal ji bo zivistanê ava dims û berhemên wê jî amade dikir lê îsal ji ber buhabûnê me ji xeynî ava hinaran tiştek çênekir. Daxwaz dikim ku her mirov sûda ava hinaran bizanibe û vexwe ji ber ku gelek bi sûd e."

# Li Kirmanşan hunera 'Patîna' vedijînin

Boyaxa kevn a bi navê Patîna, di cîhana dekorasyonê de weke cureyeke taybet a boyaxê tê zanîn. Ev rêbaza boyaxê çawa ku tişt bi demê re yanî bi awayekî xwezayî kevn bûbin nîşan dide. Avakara koma hunera Zîba û Rêvebera wê Zîba Yunsî, bi hunera patîna panelên dekoratîf û çarçoveyên zêrîn çêdike.

Zîba Yunsî diyar kir ku gelek kes derbarê hunera patîna û zanista wê de ne xwedî zanyariyane û got: "Berhemên ku bi hunera patîna hatine çêkirin, mirovan her tim dibe beriya hezaran salan. Hunera patîna ji bo muzeyan, restorantan û cihên gelerî de asta dîtbarî de giring e, mixabin ev huner hatiye terikandin û xwesertiya vê hunerê winda bûye. Bi derbasbûna salan re weke berê dihat bikaranîn, nayê karanîn."

**Dixwazin bibin nûnerê vê hunerê**

Zîba Yunsî derbarê da zanîn ku ev huner weke berê nayê îcra kirin û ji ber ku ew bi vê hunerê re mijûl gelekî kêfxweş in. Zîba Yunsî destnîşan kir ku li bajarê Kirmanşan bi destê koma hunerê ev cara yekeme ku tiştekî wisa pêk tê û got; "Ez di wê hêviyê deme dostên me yên bi rêz derbarê vê hunera balkêş û xweşik de hê zêdetir tişt werin bihîstin û em bibin nunerên baş yê vê hunerê. Koma hunerê ya Zîba ev cara yekem e ev qas cudahî û xweşiktî ava kiriye, em di wê hêviyê dene berhemên me werin ecibandin."



**Sudoku: Bersiv 73**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 9 | 7 | 6 | 3 | 8 | 2 | 4 | 1 |
| 3 | 1 | 6 | 2 | 4 | 7 | 9 | 8 | 5 |
| 8 | 2 | 4 | 9 | 1 | 5 | 6 | 7 | 3 |
| 7 | 8 | 9 | 4 | 2 | 1 | 3 | 5 | 6 |
| 6 | 5 | 2 | 8 | 7 | 3 | 1 | 9 | 4 |
| 1 | 4 | 3 | 5 | 9 | 6 | 7 | 2 | 8 |
| 2 | 6 | 8 | 3 | 5 | 9 | 4 | 1 | 7 |
| 9 | 7 | 5 | 1 | 6 | 4 | 8 | 3 | 2 |
| 4 | 3 | 1 | 7 | 8 | 2 | 5 | 6 | 9 |

**Sudoku:Pirs 74**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 9 | 8 | | 4 | | | | |
| 5 | | 7 | | 2 | | 8 | | 3 |
| | | | | | 7 | | | |
| | 3 | 6 | | | | | | |
| 4 | | 1 | 6 | | 9 | 3 | | 5 |
| | | | | | | 1 | 7 | |
| | | | 3 | | | | | |
| 9 | | 4 | | 7 | | 5 | | 8 |
| | | | | 6 | | 2 | 4 | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Tu li kû mala bavo li kû:**
- Daxwaziya te dûr e.

**Lİ SER BİTRÎ MEZİNAYÎ Û QURETİYÊ**

**Aşvanê aşê mîran bixulam e:**
- Dema yek mezin be, biqîmet be, kesên li derdora wî jî biqîmet in, qure ne.

**Axa bi deh gundên xwe ve bawer dike ku Keyxusrew e:**
- Dema yek xwe ji rewşa xwe mezintir nîşan dide, hingê jê re tê gotin.

**Bejin û balê mafîşe, xemş û tirê maşeleh:**
- Ne bejin e, ne bal e, ne bedewî ye, lê xwe bi ti kesî nade.

**Berê xwe dide ber kepiyê xwe:**
- Pir qure ye; pozbilind e; xwe pir mezin dibîne.

**Bi çavekî din li xwe dinêre:**
- Bi heman wateyê.

**Bi çavekî mezin li xwe dinêre:**
- Qure ye; xwe ji kesên mezin, (yan jî biaqil) dibîne

**Bi kuna kepiyê xwe diaxive:**
- Bi heman wateyê.

**Bilind difire:**
- Xwe mezin dizane; pir qure ye; pozbilind e.

**Bi min mêro, li min mêro:**
- Bi xêra min bûye tiştek, lê ser serê min mezinayiyê dike.

**Bi rimê Kû nagihe pozê wî:**
- Bi heman wateyê.

**Bi serê pozê xwe diaxive/bi serê pozê xwe pê re diaxive:**
- Bi heman wateyê.

**Bi ser tiliya mirov de namîze:**
- Bi heman wateyê.

**Bi ser tiliya kul de namîze:**
- Bi heman wateyê.

**Bi stêran re bi hev diçe:**
- Bi heman wateyê.

**Bivir parxanê (parsû, peresû) wî nabire:**
- Pir qure ye; nefsa wî pir mezin e; peresûyên wî stûr in.
- Bi saya min rewşa wî baş bûye, xwe li ser serê min mezin dike.

**Bizin têr dixwe, quloçên xwe li kendalan dixe:**
- Ji bo kesên bi dewlemendiyê xwe qure dikin tê gotin.

**Bûye beranê bisko:**
- Ti kesî ser xwe re nabîne; pir qure ye.

**Çav li xwe ketiye:**
- Qure ye; xwe ser hevalên xwe re dibîne.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Çarşema Sor

Çarşema Sor cejna êzdiyan ya herî naskirî ye. Her sal, di yekemîn çarşema meha Nîsanê ya li gor salnama kevin tê pîrozkirin. Li gor baweriya êzdiya, Xwedayê alemîn her sal melekekî rê dike ruyê erdê.R-6



## Konfidralîzma Demokratîk şêwazekî Rêveberiya Xweser e

Hevseroka TEV-DEM Rûken Ehmed diyar kir ku Konfidralîzma Demokratîk şêwazekî Rêveberiya Xweser e, ku bi rêveberiya Îdarî ya ku bi riya Netew dewletê re nakokiyê dike, lê di hin şert û mercan de dibe ku ev herdû şêwe bi awayekî aşitiyane bi hev re bijîn.R-4



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1161 | 17-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# BERXWEDANA GIRTIYÊN AZADIYÊ WÊ DÎWARÊN ÎMRALIYÊ HILWEŞÎNE

**Bi dirûşma 'Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de' bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê. Dayikên ku zarokên wan di girtîgihên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dene bang li mirovên xwedî wijdan dikin, di serî de ciwan û hemû beşên civakê ku bibin denge Rêber Apo û zarokên wan yên di girtîgehan de ne.R-3**




## 'Pêwîste em li hemberî madeyên hişbir civaka xwe biparêzin'



Yek ji lingên bingehîn yên pêkanîna siyaseta şerê taybet di nava civakan de; Belavkirina madeyên hişbir e. Bi taybet belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de rê li ber Otoasîmîlasyonê vedike.R-5

## Jin bi aboriya xwe ya xweser jiyana xwe bi rêk û pêk dike



Rêveberiya nivîsgeha jin a şaredariya Qamişlo Efîfe Elî Silêman destnîşan kir ku vekirina cafê Nêrgiz yek ji projeyên wan ên sala 2024'an bû û armanca wê jî pêşxistina aboriya jin a serbixwe ye.R-2



## Jin û Şano

Tevî hemû zehmetiyên ku li hemberî jinan derdikevin wê xebata jin di milê şano de berdewam be û xurtir bibe, her wiha di riya şano de wê dozên civakê û pirsgirêkên jinan li ser dika şano derkeve pêş û bên çareserkirin.R-2

Nehir pale — Xwe bistirîne R-2
Dilyar Cizîrî — 22'ê Nîsanê hat û hîn Silêman Ehmed revandiye! R-4
Farûk Sakik — Manevrayên xeternak R-5
Zekî Bedran — Rojhilata Navîn difûre R-5
Kemal Necim — Dîsa mijara rexneya wêjeyî R-7

# Jin û Şano

Tevî hemû zehmetiyên ku li hemberî jinan derdikevin wê xebata jin di milê şano de berdewam be û xurtir bibe, her wiha di riya şano de wê dozên civakê û pirsgirêkên jinan li ser dika şano derkeve pêş û bên çareserkirin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Berî şoreşa 19`ê tîrmehê, rola jinên Rojavayê Kurdistanê di şano de pir lawaz û tune bû, ev yek jî ji ber hişmendiya civakê bû. Jinan pir zehmetî didîtin da ku cihê xwe di qada şanoyê de bigrin. Lê piştî şoreşa Rojava di tevahî qadan, jinê cihê xwe girt û bi rola pêşengtiyê rabû. Bi taybet di qada şano de roleke pir girîng lîst û bi hezkirin û baweriyeke mezin tevlî şano bû. Derbarê rola jinê di şanoyê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê mijarê şanogera Yara Sarim û derhênera jin Fatima Ehmed ji Rojnameya me re axivîn.



Yara Sarim



Fatima Ehmed

Şanoger Yara Sarim di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Di civaka me de her tişt ji jinê re hatiye qedexekirin, bi taybet jî di qada şanoyê de ku çawa jineke wê derkeve ser dikê û xebata xwe pêşkêş bike. Divê em weke jin van nêrînan paş guh bikin û sînoran bişkînin tevlî warên jiyanê bibin bi hezkirin tevlî qada şano bibin û pirsgirêkên xwe di riya şano de pêşkêş û çareser bikin. Ji ber hişmendiya ku di serê jinê de hatibû çandin tenê karê xwe di malê didît tevlîbûna wê di warên jiyanê de kêmbû bi taybet di warê şano de, di gelek astengî û zehmetiyan derbas bû heta gihaşt vê asta ku îro tê de ye. Piştî şoreşa Rojava jinê cihê xwe di nava şano de bi awayekî balkêş girt. Jinan gelek pêşketin di nava xwe de çêkir û nêrînê çewt ên civakê ji hêla wê guhert, lê em nabêjin ku pirsgirêka tevlîbûna wê di nav şano de bi temamî hat rakirin hîn jî ev pirsgirêk berdewame lê bi awayekî kêm e.”

Şanoger Yara Sarim diyar kir ku jinê di riya pêşkêşkirina şano de bandoreke mezin li civakê dike û wiha got: “Derketina jinan li ser dikê û pêşkêşkirina şano bandoreke mezin li ser civakê dike, di riya şano de gelek mijaran ji civakê re diyar dike û gelek tiştan zelal dike, di şano de pirsgirêkên civakê yên zehmet û şaş tê çaresrkirin, herwiha hebûna jinan di nava şanoyê de gelek hestên xweş dighîne beşdaran û şanoyê zengîn û xurtir dike.”

Şanoger Yara Sarim axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Bi hezkirin û gotinên xwe yên bi wate û bi dansê şanoya xwe pêşkêş bikin, sînorên ku li ber azadiya we disekine bişkînin û tevlî qadên jiyanê bibin bi taybet di qada şano de ji ber ku di şanoyê de mirov azadiya xwe hîs dike. “

Derhêner endama Tevgera Hîlala Zêrîn Fatima Ehmed ji rojnameya me re axivî û got: “Şano hunereke nêzîkî civakê, piştî zehmetiyên ku jin têde derbas bû îro li bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî rehet tevlî qada şano dibe û xebatên xwe pêşkêşî civakê dike.”

Di heman çarçoveyê de Nivîskar û derhêner Fatima Ehmed jî da zanîn ku piştî şoreşa Rojava jin bû pêşenga civakê û wiha got: “Piştî şoreşa Rojava rewşa jinê di tevahî warên jiyanê de hat guhertin, êdî jin tevlî hemû warên jiyanê bû, çi warê siyasî, leşkerî û hunerî bi taybet di şano de jinê cihê xwe girt û di riya şano de hemû hestên xwe diyar kir, îro baştirîn jinên şanoger xelatan distînin û li hemû herêman şanoyan pêşkêş dike û mohra xwe di vî warî de da. Ji ber ku jin dizanin şano jî weke nameyekê ji civakê re ye vê nameyê li ser dika şano pêşkêş dikin û hezkirina xwe ji şano re dixin xizmeta civakê de.”

Derhênera jin û endama Tevgera Hîlala Zêrîn Fatima Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “Em weke Tevgera Hîlala Zêrîn giringiyê didin wêje û hunera jinê di her milî de, çi mûzîk, guvend û bi taybet şano piştgiriyeke gelek mezin dide jinê di milê perwedê de an peydakirina pêdiviyên lazim ji wan re tê pêşkêş kirin da ku bi awayekî serkeftî derkevin nava civakê . Divê îrade û îsrar di kesayeta jinê de hebe daku vî karî bi hezkirin berdewam bike.

# Jin bi aboriya xwe ya xweser jiyana xwe bi rêk û pêk dike

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Rêveberiya nivîsgeha Jin a Şaredariya Qamişlo Efîfe Elî Silêman destnîşan kir ku vekirina cafê Nêrgiz yek ji projeyên wan ên sala 2024’an bû û armanca wê jî pêşxistina aboriya jin a serbixwe ye. Her wiha Elîfe Elî diyar kir ku pêşxisitna pirojeyên jinan derfetên kar û xebatê li pêşiya jinan hîn bêhtir vedike û dihêle ku jin ji hemû milî ve hîn bêtir baweriya xwe bi xwe bîne.**

Destekdayîna ji bona  jinan ji hêla aborî ve wê bi xwe re gelek guhertinê di nava civakê de û bi taybet ji bona jinê pêkbîne. Pêşxistina pirojeyên taybet girêdayî jinê derfetê li pêşiya jinê bêhtir vedike ku bi rengekî hîn çalak tevlî nava kar û barên civakê bibe û ji sînorên malê derkeve û hîn baştir behreyên xwe bibîne û pêşbêxe. Jin jî li kêleke mêr di hemû beşên jiyanê de cihê xwe digre û tu astengî li pêşiya tevlîbûna wê ji kar û xebatê re nîne û di roja îro de hemû zehmetî û astengiyên heyî derbaskirine û di civakê de bûye xwedî bandor.



Girêdayî pêşxistina pirojeyên jinê û pêşxistina abûriya wê rêveberiya nivîsgeha Jin a Şaredariya Qamişlo Efîfe Elî Silêman destnîşan kir ku di çarçoveya sala 2024’an vekirina Cafê Nêrgiz yek ji projeyên ku wan dabû destpêkirin bû û wiha got: Yek ji karên nivîsgeha Nêrgiz ew e ku xwedî li jinan û projeyên wan ên teybet derkevin. Di serî de me pirojeya Cafê Nêrgiz bi derfetên kêm vekir û armanca me ji vekirina wê jî xizmeta jinan û civakê bû û vekirina derfetên kar ji bona jinan bû.

**Ji projeyên sala 2024`an (Nêrgiz Cafê)**

Ji projeyên ku şaredariyê destpêkirbû yên girêdayî jinan di sala 2024’an Rêveberiya Nivîsgeha Jin a Şaredariya Qamişlo Efîfe Elî Silêman got: “Me komek ji projeyan di vê salê de lêkolîn kirbû, yek jê projeya vekirina Cafê Nêrgiz bû û bi vî rengî amedekarî ji bona pêkanîna wê çêbû. Cafê li bajarê Qamişlo û li taxa Siyahî hate vekirin. Pirojeya Cafê bi qasî mehekî ye ku amedekarî jê re tê  kirin û neha amedeye ku pêşwazîkirina welatiyan bike.

Di Nêrgiz Cafê de wê tenê jin kar bikin, tê de vexwarinên sar û gerim wê werin pêşkêş kirin, armanc jê derfetên kar ji bo jinan û bi taybet jî jinên ciwan zêdetir werin vekirin û bi riya vê yekê hîn bi rengekî çalak cihê xwe di nava civakê de bigrin û her tim çavê wan ne li zilam be û li benda zilam be.

Rêveberiya nivîsgeha Jin a Şaredariya Qamişlo Efîfe Elî Silêman di berdewamiya axaftina xwe de got: “Ev piroje ji bona jinan ne projeya yekem e; li herêmê gelek pirojeyên mîna wê hatine vekirin û bi awayekî serkeftî kar û xebata wan bi encam bûye.

Efîfe Elî Silêman got ku: Pêwîste ku jin ji vî karî şerim nekin, ji ber ku ev karekî asayî ye li her deverê û li cîhanê jî jin bi hêsanî cihê xwe di gelek pirojeyên mîna van de û ji mêran zêde tirk digre û di karê xwe de jî serkeftin pêkanîne.

Efîfe Elî Silêman Wiha axaftina xwe domand:” Jinên ku dixwazin kar bikin dudilî nebin, ji ber ku jin jî mîna mêran ne û ne jê kêmtire. Her wiha divê her dem jin hewil bide ku hêvî û xewnên xwe bi destê xwe pêkbîne. Weke dij jî pêwîste ku projeyên taybetî ji bona jinan bêne vekirin weke karê xwaringehan û baxçeyên zarokan û hwd.. hemû projeyên hatine vekirin ji bo afirandina derfetên kar ji bona jinan û ji bona ku jin xwe nespêre tu kesî û bi xwe pêşeroja xwe diyar bike.

**Projeyên Nivîsgeha Jin di Şaredariya Qamişlo de**

Hêjayî bibîrxistinê ye ku nivîsgeha jin a şaredariya Qamişlo çend projeyên taybetî yên girêdayî jinan ava kirbûn, ji wan jî mîna Projeya Şiştina Cilikan ku çar jin tê de kar dikin û projeya Salona Werzîşê jî yek ji van pirojeyan bû.

Projeya Baxçeyên Zarokan li bajarê Qamişlo mîna: Baxçeya şehîd Awaz ku 11 mamoste tê de kar dikin û baxçeyê şehîd Ararat ku 6 mamoste têde kar dikin, baxçeyê şehîd Emîne 8 mamoste têde  kar dikin.

**Ji Pênûsa Jin**

## Xwe bistirîne

**Nehîr Pale**

Sîstema baviksalarî di mejiyê civakê de rêbazê xwe sitirandin çandiye û êdî ew rêbaz ji bo jinê pîvanê berdewamiya jiyanê hatiye diyar kirin. Jin ji temenê xwe yê biçûk heyanî ku fîzîkî dimre her tim jê re tê gotin: `Xwe bistirîne`. Stara jinê çi ye û kî ye? Mêr û zewcandin e? Jinên ku ne zewicî bin, yên ku bav û birayên wan tine bin hemû li gorî zîhniyeta heyî bê star in. Li gorî rêbazên çareseriyê ku hatine diyar kirin, divê mêrek li malê hebe, yan ew jin bê parastinin û stara wan nîne, êdî stara jinê gihîştiye asta bibe diyarde û di encama wê de pirsgirêk derbikevin an jî rêbazên balkêş ji bo çareseriya vê pirsgirêkê werin bikar anîn. Jin bê mêr bimînin ji bo wan û ji bo civakê pirsgirêkeke gelekî mezin e.

Li Dêra Zorê dayîk û keçên xwe bi tenê bûn, bav mirî ye û di malê de lawik nîn in. Apanên wan keçikan mêrekî ku ji dûrve dighîje wan weke star danîbûn gel wê dayîkê û keçên wê. Bawerî dabûn wî mêrê xerîb ku parastina hevjîna birayê wan û keçên wî bike, lê belê bawerî nadin dayîk û keçên wê ku parastina xwe bikin. Dayîk û keçên xwe dixebitîn û xizmeta wî mêrî dikirin, ew mêr jî li ser keda wan tenê dixwar û xew dikir. Li gel civakê ew mêr stara wan jina ye û pesna wî didin. Di heqîqetê de civak dibe sedema derketina efendî û koleyan.

Dema ku em dibêjin jin bi koletiyê tê fetisandin, îfadeya vê yekê dike. Şûna jin bizewacê û bi mêr stara xwe bike bila fêr bibe bixwe parastina xwe bike. Li benda mêr nemîne ku wê birêve bibe, bi xwe xwe birêve bibe û çareseriyê ji pirsgirêkên xwe re deyne. Her tim pêdiviya jinê bi mêr çênebe. Ji tiştekî netirse û baweriya wê pê hebe. Hemû rêbazên ku sîstema baviksalarî weke çareserî ji jinê re datîne ji çareseriyê dûrin û wê fêrî koletiyê dikin, jinê lewaz dike û koletiyê bi wê didin qebûlkirin. Jin ji bo bikarbin ji malê derbikevin divê bav, kur, bira yan jî hevjînê wan bi wan re bin. Mêr stara jinê têne dîtin. Heyanî ku ev zîhniyet li gel civakê heye pirsgirêka zayendperestiyê nayê çareser kirin. Di encama zîhniyeta mêrê desthilatdar de enceq jinên kole derbikevin holê.

Rêber Abdullah Ocalan yekemîn car jin û malbat analîz kir, zayendperestî heyanî kokên wê lêkolîn kir û rêbazên rizgarkirina jinê ji koletiyê danîn holê. Yek ji wan rêbazan kuştina mêr û qutbuyîna ji mêr bû. Ango jin ji aliyê fikir, ruh û fîzîk ve ji mêr qut bibe. Ji zaroktî ve were fêrkirin ku bixwe parastina xwe bike, her tim nebe pariyekî hesan di destê mêr de.

Civak bêjeya sitrandin di hinek rewşên dîtir de jî dide bikar anîn. Mînak dibêjin:`Stara xwe bike, xwedê em sitirandin` ango ev bêje li gorî zîhniyeta sîstema baviksalarî tê bikar anîn. Civak bi vê zîhniyetê lewaz dikeve û bandorê li ser têkiliya di navbera jin û mêr de dike.



# Gundekî kevnar: Sikir El-Ihêmir

Sikir El-Ihêmir ji kevntirîn gundên Herêma Cizîrê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û dergûşa mirovahiyê ya 8 hezar sal B.Z ye. Gundê Sikir El-Ihêmir jî 4 sal zêdetir e bi êrîşên dewleta Tirk re rûbirû ye.

Çerxa dîroka 12 hezar salan, li ser erdnîgariya 14 hezar girên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hê jî digere. Bêhna şoreşa neolotîkê û çanda xwedawendan careke din ji gund, gir û çem û kevneşopiyên wê difûre. Her çiqasî desthilatdar, dagirker û mêtingeran hewl didan bi êrîşên pergala desthilatdar hevbeşiya jin, jiyan û civakê parçe bikin jî nikaribûn ji ber ku jin di pîvanên edalet û wekheviyê de her tim digihîştin hev û ev dibû sedem ku dîroka xwe heta îro biparêzin.

Jin bi hişmendiya ku dîroka wan di roja îro de veşartî ye, li dora girên gundên xwe dicivin û hewldana derxistina wê rastiyê dikin ku toza hezaran sal ji ser paqij bikin û careke din xwedawendiyê bikin. Di vir de jin di hemû ol û baweriyên Mezopotamyayê de digihîjin hev, ji ber ku armanca jiyan û têkoşînê dibe yek.

Bi hezaran gund, perestgeh û bajarên kevnar li ser axa dewlemend ya Kevana Zêrîn di navbera rêzeçiyayên Kurdistanê de li deşt û kêleka rûbarên Firat, Xabûr û Dîcleyê hatibûn avakirin. Yek ji wan jî gundê Sikir El-Ihêmir e.

**Şahidî ji serdema Osmanî û Fransîyan re kiriye**

Ji ber bandora karesetên xwezayî yên wekî lehî, erdhej, hişksalî, bahoz û hwd. gelek gund û bajarên herêmê dihatin terikandin an jî ji ber êrîş û şerên li herêmê çêdibûn dihatin hilweşandin. Yek ji girên herî navdar û xwedî cihekî herî girîng û stratejîk di herêma Cizîrê de gundê Sikir El-Ihêmir e ku 7 km. li rojavayê navçeya Til Temirê ye û li ser qiraxê çemê Xabûrê bedewiya xwe her demsal nû dike. Gundê Sikir El-Ihêmir şahidî ji serdema Osmanî û Fransiyan re kiriye.

Wekî hemû giran, li ser vî girî jî gelek gor hene û hinek ji wan veguherîbûn goristanan. Gorên ku hatibûn çêkirin jî ji ber rewşa avhewayê û karesetên xwezayî bi gir re bûne yek, ew kevirê li ber serê mirî tenê dibe nîşaneya hebûna goran. Li gorî lêkolînan jî ev gor û goristan piranî di sedsala 19-20’an de çêbûne û mirov dikare wan wekî nîşaneyên parastina damarên kevnar ên vê axê şîrove bike.

**Di sala 1991’ê de hat dîtin**

Girê Sikir El-Ihêmir di sala 1991’ê de ji hêla mîsyonek Fransî ve hat dîtin û belgekirin. Berî ku vekolîn di sala 2000’an de ji hêla mîsyonek Japonî ya Zanîngeha Tokyoyê ve dest pê bikin. Çanda gir bi çanda Çiyayên Torosê ve girêdayî ye. Lêkolîner û rêveberê berê yê kevnar li bajarê Helebê, Yûsif Kenco, di pirtûka xwe de bi navê (Ji sed deverên arkolojîk ên Sûriyeyê) de piştrast dike ku çanda girê Sikir El-Ihêmir bi çanda çiyayê Torosê ve girêdayî ye, Toros jî yek ji çiyayên naskirî yên di erdnîgariya Bakurê Kurdistanê de ye, ev yek jî li ser bingeha nimûneyek ji xaniyên guloverî hatiye avakirin de, hat diyarkirin.

**Xwedawendiya jinan**

Vedîtinên arkeolojîk ên ku ji van tabûtan derketine, hebûna peykerên jin ên li herêmên ku di nav jîngehên herî kevn ên şaristaniya mirovahiyê de têne hesibandin, nîşan dide.

Parçeyek ku ji hêla arkeologê Japonî Yoshiro Nishiyaki ve li Sikir El-Ihêmir hat vedîtin. Ev peyker di serî de bi rûyê xwe yê ku bi zelalî taybetmendiyên xwe parastiye, hevsengiya xwe ya anatomîkî û dirêjahiya xwe ya 14 cm diyar dibe, xuya ye ku ew wekî amûrek rêûresmê hatiye bikaranîn. Di rastiyê de, ev peyker di nav civakên ku ew çêkirine û pejirandî de, derbarê fonksiyona wan a bingehîn de gelek pirsan derdixîne holê. Arkeologan digotin ku ew xwedawenda dayikê ya ku di baweriyên civakên şaristaniya Til Helefê de cîhekî bilind girtiye temsîl dike, bi şeklê konî hatiye çêkirin, pozîsyona rûniştinê digre, ji bo ku were parastin di konteynerên dirûnê de were nîşandan. Îhtîmal e ku ew jî li jora nîşkan li cihên ku ji bo pêkanîna ayînan hatine destnîşankirin hatiye danîn.

**Yek ji mezintirîn niştecih û civatên çandinîyê yên çemê Xabûrê ye**

Gundê Sikir El-Ihêmir dibe yek ji kevintirîn û mezintirîn niştecih û civatên çandiniyê yên qiraxa çemê Xabûrê. Li gund zêdetirî 100 mal hene û piraniya wan jî ji pêkhateyên Ereb û êla Begara ya Çiyayê Kizwanan pêk tên. Malbatên Kurd tenê di salên 50 heta 95’an de li gund jiyane. Her wiha dibistana gund di salên 80’yî de hatiye avakirin. Ji ber xêr û bêra li gund, malbat ji parêzgeha Heleb û Idliba Sûriyeyê dihatin gund cotkarî dikirin.

Bedrîya Hisên dapîreke 68 salî ye û dayika 6 zarok û 13 neviyan e, çend hûrguliyên hêja wekî bejn û temenê xwe ji dîroka gund heta çanda wê û hwd. bi me re parve kir.

**Çîroka navê gund**

Bedriya Hisên yek ji wan çîrokên ku li ser wateya navê gund dihatin gotin wiha di dawiya axaftina xwe de dibêje: “Berê li çemê Sikir El-Ihêmir gelek naûreyên avê hebûn. Ji ber ku nêçîrvanan gelek pezkovî li ser çem qetil dikirin, ava çemê Xabûrê vediguherî gola xwînê ji lewre her navê gund wiha me Sikir El-Ihêmir ango (Gola xwîna sor) bi wateya xwe ya Kurmancî dan.”



**‘Xabûr e!’**

Bedriya Hisên behsa çemekî dirêjahiya wî 320 km. ye dike çemekî ku çavkaniya wê Riha û Mêrdîna Bakurê Kurdistanê diherike û ber bi Rojavayê welat ve diherike dike û wiha dibêje: “Çemekî wisa ye ku gelekî bi xêr û bereket e. Li ser çem jin diciviyan û bi hev re xalîçe û cil dişûştin û bi satilan av jê dikişandin gund û ji bo vexwarinê bi kar dianîn. Li kêleka zeviyên çandiniyê, werzên tirî û hinaran jî dihatin avdan. Ya herî zêde me li ser wî çemî hirî dişûşt. Herikandina ava wê dilê me mest dikir. Ev Xabûr e! Ava wê zelal, paqij û mîna neynikê ye.”

**Ji dapîrê rexneyek bo nifşên nû: Mode ne çanda me ye**

Bedriya bi hestên bêrîkirina rojên berê û girîngiya wê nifşên nû bi awayekî nerm rexne dike û wiha dibêje: “Keçan kezîyên xwe yê dirêj bi ser cil û bergên xwe yê ji dapîra xwe girtibûn berdidan. Berê jinek bêyî kiras û xeftan derîyê mal derbas nedikir, lê niha nifşên nû hemû jî li gorî modêyê diçin û cil û bergên çanda xwe paşguhkirine. Heta niha jinên temen mezin çanda xwe ya ji dapîrên xwe girtine diparêzin û taybet cil û bergên folklorî. Xêr û bêra heyî di rojên berê de ye.”

**Rêûresmên jinan di şînan de guherî**

Bedriya Hisên behsa çanda jinên Ereb di rêûresmên şînên mirîyan de û guhertina ku çêbûye bibîrxist û got: “Şîn jî wiha bûn ku konê şînê 3-4 rojan li erdê dima û jinan kezîyên xwe dirûçikand, rûyê xwe diqetandin û li xwe dixistin. Wiha xemgîniya xwe ya li ser kesa/ê mirî dianîn ziman. Ruxmî ku tişta jinan dikir pir şaş û guneh bû. Lê niha rewş hat guhertin, heta 3 rojan kon ji erdê radikin û li ser mirî êdî ewqasî li xwe naxin, rûyê xwe pirûnce nakin û kirasê xwe naqetînin. Niha ji bo şînan guhertinek baş çêbûye.”

**Di hembêza Çiyayê Kizwanan de dema bêrî û koçeriyê**

Bedrîya Hisên rojên bêrîyê û koçeriya di nav deşt û newalên Çiyayê Kizwanan de tîne bîra xwe û wiha bi hesreta vegera wan rojan diaxive: “Li şûna avahiyan, me kon vedidan û wiha dest bi rêwîtiya koçeriyê di hembêza Çiyayê Kizwanan de dikir. Li kêleka bêrîyê û dotina pez, me kon jî bi alavên kevin jî çêdikir û meşik bikardianî. Lê niha ew kon neman e, avahî hatine lêkirin û her malbatekê çêleka xwe li ber mala xwe girêda ye û jiyan wiha bûye.”

Bedriya Hisên di axaftina xwe de bal kişand ser mijareke gelekî girîng di nav civakê de û wiha wê bi dilxweşî bilêv kir: “Berê nedibû ku keç bi xortan re bimeşe, ji lewre malbatan ew nedidan xwendin. Ez jî wiha me, malbata min em tenê bi xwedîkirina pez û şivaniyê re mijûl dikirin û min nedan xwendin. Bi ti awayî dîtina keç û xortan bi hev re qebûl nedikirin lê niha rewş guherî û malbat êdî keçên xwe dişînin dibistanê û didin xwendin. Berê nezaniyê çavên malbatan kor kiribû, lê niha keçik ligel hevalên xwe yên xort dixwînin û diçin û tên dibistanê. Ne wekî ku difikirîn, pir normal e keç û xort bi hev re bixwînin. Di vir de qedirdayina keçan dest pê kir.”

**Şênî bi av û axê topên dewleta Tirk bêbandor dikin**

Wekî her gundî Sikir El-Ihêmir jî 4 sal zêdetir e bi êrîşên dewleta Tirk re rûbirû dimîne û li ser malên şêniyan jî şopa top û çekên giran ên ku bi kar anîne hene. Şêniyên gund şopa êrîşan ji kamerayên me re nîşan dan û der barê betalkirina topan de jî ev agahî dan. Şêniyan gotin ku dewleta Tirk bi awayekî hovane gundê wan ê tijî sivîl topbaran dike. Her wiha gelek topên hawanan û çekên giran li gund dikevin lê belê nateqin, wiha ji bo ku bandorê li wan neke, topê dikşînin û davêjin bîrên kûr ên avê, yan jî erdekî 3 metre dikolin topê dixin navê û li ser tijî av û ax dikin heta ku bêbandor dibe.**NÛJINHA**

**Têbînî**



## Dîsa mijara rexneya wêjeyî

**Kemal Necim**

Her ku qada dahênan û nivîsîna wêjeyî berferh dibe, hijmara nivîskar û dahêneran zêde dibe û berhemên wêjeyî yên nû derdikevin, pêre jî, weke pêşketineke diyalektîk, asta hilbirîna wêjeyî jî bilindtir dibe. Her biçe dê şêweyên nivîsînê nû bibin, rewanbêjî û peyvsazî û hevoksazî dê qeşengtir bibe, her wiha naverok û mijar û babetên hilbirîna wêjeyî jî dê watedartir û bibandortir bibe.

Girêdayî vê geşedan û pêşdeçûnê, dîse girîngî û pêwîstiya rexneya wêjeyê diyar dibe û pêdiviya qada wêjeyê bi rexnegirên hosta û pispor zêde dibe.

Ta niha di qada wêjeya Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê de li gorî pêşketina dahênan û nivîsînê, rexneya wêjeyî pêş neketiye û hijmareke mezin ya rexnegirên zana û bi berpirsyar jî derneketine. Çend kesên ku li gor hinek pîvan û metod û alavan hewil didin carna deqên rexneyî der barê hin berheman de binivîsin. Ji xwe nifşê nû jî ku niha li zanîngehên herêmê beşa rexeneya wêjeyî dixwînin hîna ne ketine qada derbirîn û hilbirînê, lewma hîna ev qad wilo bê kes û bê xwedî ye.

Di demên dawiyê de hin pêşbirkên wêjeyî têne lidarxistin, ji wan Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan, Pêşbirka Çêrokê û pêşbirka deqên şanoyê. Piştî daner û nivîskar deqên xwe dişînin van pêşbirkan, êdî qonaxa nirxandina deqan destpê dike, pêwîste ji nava bi dehan deqên gihiştne pêşbirkan sê deqên herî baş bêne bijartin û xelatkirin. Lê bijartina deqan jî berpirsyarî ye, pêwîst e ku rexnegirên pêkhatî van deqan bixwînin û binirxînin û bibijêrin, eger wilo nebe dê bijartin qels û kêm be û dibe ku mafên pir beşdarên pêşbirkan bête xwarin. Lê tişta ku diyar e, kêşeya herî mezin li pêşiya amadekarên pêşbirkan ew e ka kî dê van deqan binirxîne û bibijêre. Halê hazir vê erk û berpirsyariyê didine hinek helbestvan, çîroknivîs û şanonivîsên ku ta radeyekî xwedî ezmûn in, lê bê guman ne pirspor û hosta ne.

Ji niha te ku nifşê nû yê ku li zanîngea beşê rexneya wêjeyî dixwînin, pêwîstî bi lidarxistina simînar û panêl û gotûbêjên berfireh heye ji bo ku ev mijara têkeve ber lêkolîn û vekolînê û kesên ku di vê qadê de jî mijûl in erk û berpirsyariya xwe zanibin.

Yek ji çalakiyên girîng di vê mijarê de çalakiya (Heftya Wêjeyî) ye ku ji aliyê Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve salane tê lidarxistin. Çalakî sala 2022`an li bajarê Qamişlo hate lidarxistin, sala 2023`an jî li Kobanê, îsal jî tê payin ku dawiya meha nîsanê li bajarê Dêrikê bête lidarxistin. Di çalakiyê de di qonaxa 6 rojan de simînar û panêlên derbarê mijarên wêjeyî ên cuda de têne lidar xistin, her sal sê mijarên wêjeyî têne bijartin û derbarê wan de simînar û panêl têne lidarxistin, lê ji ber girîngiya mijara rexneya wêjeyî û pêdiviya vê mijarê bi şîrove û xwendin û lêkolînê, her sal jî mijareke sereke ya bernameya Hefteya Wêjeyî mijara rexneya wêjeyî ye, di heyama du rojan de semînerek û panêleke berfereh derbarê mijarê de tê lidarxistin û ev mijar bi beşdariya mêvanên xwedî ezmûn, bi rewşenbîr û nivîkaran re tê gotûbêjkirin.

# Çarşema Sor

Çarşema Sor cejna êzdiyan ya herî naskirî ye. Her sal, di yekemîn çarşema meha Nîsanê ya li gor salnama kevin tê pîrozkirin. Li gor baweriya êzdiya, Xwedayê alemîn her sal melekekî rê dike ruyê erdê, ji bo ku nebaşiya li nav mirovan ji holê rake û başiyê di nav wan de belav bike.

**Deriya Çiya/Qamişlo**

Cejina Çarşema Sor cejina herî kevnar a civaka Êzîdiyan e. Ev cejin her sal di çarşema duyem a meha Nîsanê de tê pîrozkirin. Li gor baweriya Êzîdiyan di vê çarşemê de gerdûn hatiye avakirin. Kurdên Êzîdî di vê cejinê de hêkan dikelînin û renga reng dikin ji ber hêk temsîla nû avakirina gerdûnê dike û teşeya wê xuya dike. Civaka Êzîdî bi hezarê salan vê cejinê bi hêviya pêkanîna aşîtî û azadiyê pîroz dikin. Civaka Êzîdî ev cejin bi xwezayê ve girêdidin loma di meha Nîsanê de tê pîrozkirin û di heman demê de gel berê xwe dide nava xwezayê û kulîlkên sor berhev dikin û di gel qalikên hêkan bi deriyê malê dixin ev jî tê wateya parastina ji her awayên êrîşan.

### Çarşema Sor

Cejina Çarşema Sor cejina herî mezin e di nav civaka Êizdî de. Ev cejin her sal di çarşema beriya meha Nîsanê tê pîroz kirin. Li gorî ola Êzidî di çarşema beriya meha Nîsanê de kaynat yan jî gerdûn hatiye avakirin. Di aliyê zanistî de jî dibêjin ku diniya yan jî gerdûn piştî teqîna mezin ku bi zimanê Ingilîzî dibêjinê (Big Bang) pêkhat gerdûn hat avakirin. Civaka Êzidî bi hezarên sla vê cejinê pîroz dike. Vê civakê beriya her kesî teşe û çawa avakirina gerdûnê dizanîn. Di cejina Çarşema sor de civaka Êzidî hêkan dikelînin ji ber ku heyanî ku hêk neyên kelandin wek di hundirê hêkê dê teşeyê gerdûnê çênabe. Ji ber vê yekê divê hêk bê kelandin ji bo ku teşeyê gerdûnê bide. Wek tê zanîn di nav hêkê de şeklê rojê jî heye, ew jî zerika hêkê ye.

Serê sibeha cejinê her kes zû ji xew radibe û berê xwe dide rojê ji bo hemû diniyayê ibadet dike, piştî wê ji bo mêhvanan lawir tên serjêkirin û şîrnahî tê belavkirin û hêk bi hemû rengan tên rengkitin ji ber ku dema gerdûn hat avakirin her der bi gulên renge reng hat xemlandin. Serê sibê her kes berê xwe dide çolê kulîlkên sor berhev dike û dibe mal di gel qalikên hêka bi deriyê malê ve dikin, wata vê yekê jî, ji bo ku ji her êrîşê bên parastin. Her wiha di roja cejinê de qalikên hêkê her kes dibe nav dexil û danê xwe ji bo ku Xwedê berket bavêje nav. Serê sibê yên ku miriyê wan yên nû jiyana xwe ji destabin hebin diçin ber mezargehên xwe yên pîroz û serdana miriyên xwe dikin, di heman demê de xwarinê dibin li wir belav dikin. Di roja cejinê de nabê kes biçe ser karê xwe. Her weha di meha nîsanê de nabê kes bizewice rêzgirtin ji meha pîroz a nîsanê re.

### Mîtolojiya baweriya êzidiyan

Çarşema Sor di mîtolojiya baweriya Êzidiyan de, teqabulî roja afirandina alemê dike. Dinya di wê rojê de hatiye avakirin û Melekê Tawis hatiye ser rûyê zemînê. Ev roja pîroz, roja efûkirina gunehan, pak û paqijbûna ji gemariyên dinyayê ye. Ev roj, roja afirandina silhê, qayîmkirina biratiyê ye. Çarşema Sor anku Çarşema Serê Nîsanê, di mîtolojiya Êzidiyan de destpêka biharê, anku roja nû ye. Di baweriya Êzidiyan de ev roj, Melekê Tawis xirabiya li ser dinyayê xelas dike û qenciyê li hemû mirovan pêk tîne. Meha Nîsanê ji ber van sedeman ji aliyê Êzidiyan ve wek meheke pîroz û bûka 11 mehan tê qebûlkirin.






### Çima jê re dibêjin Çarşema Sor?

Êzdiya navê Çarşema Sor li cejna xwe kirine, ji ber ku di vê rojê de xweda xwîn rijandiye laşê Adem, goşt li ser wî temam bûye, xwîn di laşê wî de herikî û jiyan li ser gerstêrka cîhanê vejiyaye.

### Sira boyaxkirina hêkan çi ye?

Yek ji xwarinên taybet ên vê cejnê jî amadekirina hêkên kelandî û boyaxkirina wan e, êzdî diyar dikin ku hêk dişibin erdê, ji ber ku mîna axê dorveger e û ev cejn bi xwezayê û nûbûnê ve girêdayî ye, yanî bi wateya di biharê de erd xemilandin û bi vî awayî Newroza Êzidiyan tê pêşwazîkirin.

### Peresgeha Laleşê

Li perasgeha Laleşê di danên êvarê de agir pêdixin, li kolanan mûmên ji zeyta zeytûna pêdixin. Ciwan jî li qadê agir gur dikin û xwe ser re davêjin. Bi avêtina li ser agir ciwan dibêjin:"Ey agir, rengê zer bibe û rengê xwe yê sor bide min."ango rengê zer nexweşiye û ya sor jî tenduristî û saxî ye. Her wekî tê zanîn agir di ola Êzîdiyan de pîroz e. Nîşaneya ronahiyê û xelasiya ji reşiyê ye.

Peresgeha Laleşê, di baweriya Êzîdiyan de Laleş cihê herî pîroz e, li geliyê Şêxan dikeve, ji hêla Sumeran û hin şaristaneyên din ve hatiye avakirin. Êzîdî carekê di jiyana xwe de diçin ber lalişê û şeş rojan dimînin. Her wiha kesên li wê herêmê dimînin di payîzê de serlêdana lalişê dikin, ji 23'ê Eylûlê heya bi 1'ê cotmehê dimînin.

Di baweriya Êzîdiyan de, di vê mehê de xweza xwe nû dike û hêk çêdibe. Ji ber vê jî hêk di baweriya wan de girîng e. Di vê rojê de êzîdî 12 hêkan dikelînin û her 3 hêkan bi rengê demsalekê dixemilînin. Hêk di baweriya êzîdiyan de sembola erdê, avabûn û vejîna jiyanê ye. Ango tiştê di hundirê hêkan de, di erdê de jî heye. Kelandina wê nîşaneya çêbûna erdê û qaliqa hêkan jî helandina qeşayê ye, her wiha rengê ku li hêkan dikin jî nîşaneya hatina Melekê Tawis, gul û jiyan dest pê kiriye.

### Çar cejin di cejinekê de tê pîroz kirin

Di baweriya êzîdiyan de Çarşema Sor çar cejinan bi hev re dike yek. Yekemîn cejin dema gerdûn çêbûye û teqiyayî. Ji çar hêmanan pêk hatiye av, ax, ba û agir. Ango hêmanê hişk, rûn, gaz bilezme bi hev re bûne yek stêrk û gerestêrk çêbûne.

Cejina duyemîn bîranîna kelandin, cemidandin û keskaniya erdê radigihîne. Ev jî bi kelandin, cemidandin û rengkirina hêkan didin diyar kirin.

Cejina sêyemîn jî dema xweda yekem zindî afirandiye û xwîn berdayê bedena wî. Ji ber vê jî dibêjin çarşema sor di Nîsana ku gulên sor û rengîn.

Cejina çaramîn ya berketê ye ango hêka yekem hatiye afirandin û zindiyê yekemîn hatiye xuliqandin. Ev jî çêbûna gerdûnê dide nîşan kirin.

Hin lêkolînerên dîrokî dibêjin ev roj vedigere dema Împiratoriya Medyayê ku di wan deman de şereke mezin rûdide û ew bi ser dikevin. Sedema pir xwîn rijandin û serkeftina ku bidest xistine şahî li dardixin, ji ber vê jê re Sor tê gotin. Hin jî dibêjin ku dema xweda Adem daye û xwîn berdayî bedena wî jiyan li ser erdê dest pêkir.

Tê diyar kirin ku gelên Êzîdî li seranserî cîhanê belav bûne. Bi taybet jî li welatên mîna herêma kurdistanê û Îraqê û paytexta Nînawa ya Îraqî û bajarên ku herî zêde kurd lê jiyan dikin. Her wiha li turkiyayê, Rûsiya, Ezerbîcan, Ermîniye,û herî zêde li Ewropayê jî gelek Êzîdî hene.

Her wiha li Bakur û Rojhilata Sûriyê jî êzîdî jiyan dikin. Weke herêma cizîr, Efrîn û taxa Şêx meqsûd li Helebê û ew hemû rojên xwe yên cejnê pîroz dikin, lê tenê nikarin biçin peresgeha giyanî Laleşê ji ber dûrbûna cihê wê.

Li herêmên Bakûr û Rojhilata Sûriyê mafên Êzîdiyan hatibû binpêkirin di dema rêjîma Baas de. Lê bi şoreşa 19'ê Tîrmehê hemû ol, netew û pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rengekî azad û demukrat cejin û kevneşopiyên xwe yên olî û rojên xwe yên pîroz û taybet di nava aramiyê de û bê astangî pîroz dikin. Êzidiyên li herêmê jî rojên xwe yên cejnê û kevneşopiyên xwe yên olî û pîroz di nava aramiyê de pîroz dikin û hemû gel û paweriyên herêmê di nava aşîtî û aramiyên de bi hevre dijîn û hemû cejn û şahiyan xwe bi hevre pîroz dikin.



# Berxwedana girtiyên azadiyê wê azadiya Rêber Apo misoger bike

Bi dirûşma 'Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de' bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê tê meşandin. Dayikên ku zarokên wan di girtîgihên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dene bang li mirovên xwedî wijdan dikin, di serî de ciwan û hemû beşên civakê ku bibin denge Rêber Apo û zarokên wan yên di girtîgehan de ne.

**Amara baran/ Qamişlo**

**Bi rihê Mazlûman berxwedana zindana didome**

Şoreşgerê mezin Mazlûm Dogan di Zindana Amedê de li hember sûcên dijmirovî û hovîtiyên cûntaya faşîst a Dewleta Tirk bi dirûşma "Berxwedan jiyan e, bîrkirin îxanete" teslimiyêtê qebul nekirin, di roja meya îro de rihê Mazlûm Dogan, Hayrî Dûrmûş û Kemal Pîr. Li zindanê bakûr ê kurdîstanê û tirkiyê berxwedana girtiyên azadiyê didome.

Girtiyên Azadiyê li girtîgehên bakûrê kûrdistanê û tirkiyê di çarçoveya kampanya navneteweyî " ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî" di 27'ê mijdara 2023' yan de dest bi gireva birçîbûnê ya bê dorveger kiribûn. Girtiyan destnişan kiribûn ku heta 15'e Sibatê roja komploya navnetewî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan neyên qebûlkirin wê çalakiya xwe derbasê qonaxekî nû bikin.

Girtiyên PKK û PAJK'ê di 3'ê Nîsanê de bi daxûyaniyekê ragihandin ku bi boneya 4'ê nîsanê roja rojbûna Rêberê gellê kurd Abdullah Ocalan çalakiya xwe derbasê qonaxa duyemîn dikin.

Yek ji girtiyên ku tevlî girevê bûye Emîne Kaya, ya li girtîgeha Bakirkoy a Jinan ku li Îstanbolê girtiye, Dayka Emîne, Meryem Soylu derbarê rewşa girtiyan axifî û wiha got: Divê em ji vê zilmê re bêjin edî bes e, girevin birçîbûnê di bin şertên giran da pêk tên. Çalakiya ku ji bo Rêberê gele kurd Rêber Abdullah Ocelan hatiye destpêkirin watedare, divê gellê me xwedî li îrada xwe û Serokê xwe derkevin.



Meryem Soylu wiha behsa keça xwe Emîne Kaya kir: Emîne dayika 5 zarokane ev 4 salin rûxmê rewşa wî ya tenduristî nebaşe ji di girtîgehên dewleta tirk de tê girtin, Emîne ji ber ku li MEYA-DER a Îstanbolê xebat dimeşand di encama opeasyona siyasî de hat girtin 8 sal û 6 meh cezayê girtîgehê lê birin.

Girtiyên nexweş bi ringan û bi destên kelepçekirî dibin nexwaşxana û nahêlên ku girtî werin dermankin , li girtîgehên tirkiyê muamele û îşkenceyên pir xirab li ser girtiyan te meşandin.

Meryem Soylu wiha behsa rewşa girtîgehan kir: Ev nêzî 5 mehanê li girtîgehên Bakur û Tirkiyê çalakiyên girevên birçibûnê ya bê dorveger berdewam dikin 4'ê Nîsan ê bi boneya Rojbûna Rêberê gele kurd Rêber Abdullah Ocelan çalakiya girtiyên azadiyê derbasê qonaxa duyemîn bû, heta niha dewletê tu gav neavêtiye û tu heq û huquqan nasnake, Dewleta ku behsa qanûnê mirovatiyê dike rojana îşkence li girtiyan dikin. Girtiyên ku canê xwe kirine mertal ji bona doza azadiyê dixwaze teslîm bigre. Bi gefên ku hûn bêjin em ji doza xwe poşman bûne da ku we serbest berdin ger hûn qebûl nekin emê cezayê we dirêj bikin.

### Em ê li hember, dagirkeriyê serî netewînin

Dayika Emîne kaya, Meryem Soylu destnîşan kir ku herkesên xwedî wijdan divê li dijî vê rewşê bêdeng nebin û bang kir û axaftina xwe wiha domand: "Em weke gelê kurd bi salan e bindest in. Lê me qet li dijî vê rewşê serî netewand û em ê netewînin. Ez dixwazim vê bi taybetî destnîşan bikim. Şertên girtîgehê zor in. Dema em weke malbat çûn serdana dawî jî em rastî lêgerînên der mirovî hatin.

Hêjayê gotinê ye ku Emîne Kaya di axaftina xwe ya telefona dawî de tekîldarî çalakiya xwe ya bi daxwaza " ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî" axivî xwast ku hemû beşên civakê ji bo wan bibin dengek û heta azadiya fîzîkî a Rêber Abdullah Ocalan emê çalakiya xwe berdevam bikin.

### Heta ku Rêber Apo azad nebe wê berxwedana zindana bidome

Dayika T. E diyarkir ku heta ku Rêberê gelê kurd Rêber Abdullah Ocalan fîzîkî azad nebe em ê li pay doz û berxwedaniya zarokên xwe yên ku îro li girtigehên Bakurê kurdîstanê û tirkiyê di girevên birçîbunê de bin.

Dayika girtiyî siyasî T.E diyarkir ku: T.E di sala 2000'î li gûmûşxanê hat girtin 4 mehan di bin îşkenceya dewleta Tirk a dagirker de ma, piştre dewleta tirk agahî da Rêjîma Sûrî ku T.E hatiye girtin bi agahî dayina wan re Rejîma Suriyê agahî da ku "lawê wê ji aliyê dewleta tirk ve hatiya girtin li Erziromê ". Em derbasê Erziromê bûn ku em karibin T.E bibînin, lê mixabin dewleta Tirk a dagirker bi lêdanê û defşan nêzî me bû û gotin kû T.E Terorîste nehîştin em bibînin. Bi serlêdana carek derfet dan me ku em T. E bibînin û ew jî nêzî saatekî li ber pencere hevdîtin çêbû, 12 sal T.E li girtîgeha Erziromê ma, piştre wî derbasî Eizmîrê kirin li wir jî 12`e sal ma. Her wiha ev nêzî 2 sal in ku wî derbasî Edenê kirine, ew cih jî wek cihê faşîstan tê naskirin bin navê ku terorîste hucreya yek kesî de tê girtin,

T.E name ji me re şand û got" emê dest bi gireva birçîbûnê bikin, heya ku Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan Azad nebe û agahî jê neyê girtin, emê dev ji çalakiya xwe bernedin. Ji 27'ê mijdara 2023'yan ve di çalakiyê de ye, çalakiya xwe ya gireva birçîbûnê ya bê dorveger ji 4'ê nîsanê ve veguhestin qonaxeke nû. Girtiyên siyasî di vê qonaxê de biryar girtin ku dadgehan boykot bikin û bi malbatên xwe re telefonê neaxivin û dernekevin hevdîtinan.

### Li girtîgehan, Îşkence li girtiyan tê kirin

Dayîka girtiyên siyasî T.E îşkenceyên dewleta tirk li ser gîrtiyên siyasi wiha anî ziman: Rûxmê ku rewşa T.E ya tendurîstî her diçe xirab dibe nexweşiya dil, şekir û çav pê re heye, di hûcreya yek kesî de tê girtin.

Dayika T.E bîr xist ku çalakiya kurê wî û girtiyên din berdewam dike û got: "Ez bang li mirovên xwedî wijdan dikim, di serî de ciwan û hemû beşên civakê divê bibin denge Rêber Apo û zarokên me yên di girtîgehan de.

# Rêxistinên NY`yê rewşa kampên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê paşguh dikin

**Hemwextî paşveçûna rewşa koçberan, rêxistinên NY'ê erkên xwe paşguh dikin û alîkarî ji hezaran malbatan re yên li 111 kampên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dimînin, pêşkêş nakin.**

Zêdetirî 25 hezar malbatên ji deverên Sûriyeyê koçber bûne di rewşên zehmet de li 111 kampên li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dimînin. Piştî ku WHO`yê biryara rawestandina pêşkêşkirina alîkariyan ji bo kampan da, rewşa koçber û penaberan xerabtir bû. Hemwextî rawestandina alîkariyan, pêdiviyên koçber û penaberan bi stragehên guncaw, binesaziya tenduristiyê, ava vexwarinê ya paqij û perwerdeyê zêde bû.

Alîkariyên ku rêxistinên Neteweyên Yekbûyî (NY) pêşkêşî kampên herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin, têrê nakin. Alîkarî digihêje hin kampa lê belê hin kampên din bê alîkarî dimînin.

Rêveberiya Xweser jî li gorî derfetên xwe alîkarî ji koçber û penabaran re pêşkêş dike. Lê belê êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmê û hedefgirtina binesaziya wê, stasyonên avê, kehrebeyê û gazê barên Rêveberiya Xweser girantir kir, aloziya koçberan jî girêktir kir.

### 41 ll kantona minbicê hene

Li kantona Minbicê 41 kamp hene. Ji wan 2 birêxistinkirî û 39 bêserûber in. Di kampan de 2 hezar û 584 malbat hene piraniya wan ji herêmên hikumeta Şamê ne wek rojhilatê Helebê, Sifîrê, Bab, Dêrhafir û Meskenê yê Himsê.

Koçberê ji Dêrhafirê yê rojhilatê Helebê Derwîş Elî El Casim ku li kampa Resim El Exder a nû dimîne ji ajansa me re got: "Rewşa binesazî li kampê xerab e. Kadroya dibistanê ne temam e. Navendeke tenduristiyê heye lê belê derman lê nîne eger hebe jî hindik e û nikare hejmareke zêde ya nexweşan pêşwazî bike."

El Casim wiha domand: "Kon êdî qetiyaye, ji 4 salan ve nehatiye guhartin. Ew me ne ji germayê ne jî ji sermayê diparêze. Piraniya koçberan nikarin konên xwe biguherînin ji ber ku biha ne. Her wiha ji ber şilî û sermayê nexweşî belav dibin."

### 11 kampên li Tebqayê ne

Li kantona Tebqayê 11 kamp hene. Ji wan 2 birêxistinkirî û 9 bêserûber in. Tê de 4 hezar û 136 malbat hene. Koçberê ji bajarê Hemayê Muteb El Zuleyfan ku li kampa El Tiwêhînê dimîne got: "Ji ber kêmbûna xwarinê, tunebûna navendeke tenduristiyê ya sabit û kêmbûna dermanên nexweşiyên giran wek şekir û tansyon belav dikin. Jilewra em gelek zehmetiyan dikişînin."

El Zuleyfan bang li rêxistinên navneteweyî kir ku pêdiviyên koçberan peyda bikin di serî de kon, xwarin û dermanên paqijiyê. Her wiha bang li Rêveberiya Xweser kir ku nan zêde bike û navendên tenduristiyê di kampê de ku 24 saetan kar bikin, bi cih bike.

### 11 kamp Dêrazorê heye

Li kantona Dêrazorê 9 kampên bêserûber û 2 yên birêxistinkirî hene. Tê de 6 hezar û 77 malbat dimînin.

Koçbera ji herêmên hikumeta Şamê Xezne El Feyad ku li kampa bêserûber a Sifîrê dimîne ji ajansa me re der barê rewşa xwe de wiha axivî: "Em ji 6 salan ve koçber bûne û rewş her ku diçe xerabtir dibe. Lê niha xizmetên sereke ji ser me kêm bûne."

Xezne hêvî kir ku rewşa wan baştir bibe û got peydakirina navendên perwerdeyê ji bo fêrkirina zarokan gelek girîng e.

### 50 kamp li Reqayê hene

Li kantona Reqayê jî 50 kampên bêserûber hene. Tê de 13 hezar malbat bi cih bûne. Rewşa wan jî xirab e. Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Reqayê ji bo peydakirina çareseriyan di nava hewldanan de ye.



### Hewldanên rêveberiya xweser

Der barê rewşa kampan û rêbazên vegerandina koçberan li warên xwe de piştî misogerkirina mafên wan, hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed got: "Hemwextî paşguhkirina NY'ê, rewşa kampên li herêmê zehmet e. WHO û Rêxistina Tenduristiyê ya NY bi awayekî fermî ragihand ku ew ê êdî alîkariya tenduristiyê ji bo kampan kêm bikin."

Ehmed wiha domand: "Topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî binesaziya herêmê û rûxandina stasyonên kehrebe, av, gaz û petrolê bi awayekî neyînî bandor li pêşkêşkirina alîkariyan kir û aloziya li wan kampan girêktir kir nemaze bi hatina havînê re."

Ehmed diyar kir ku Rêveberiya Xweser hewl dide li gor pîvanên mirovahiyê vegereke ewle û birûmet ji bo hemû koçberên ku bi darê zorê yan ji ber şer hatine koçberkirin, misoger bike.

Ehmed di dawiya axaftina xwe de got: "Li gorî wê jî Rêveberiya Xweser bi koordîneya rêxistinên mirovî û hiqûqî hewl dide vegera koçberan li warên xwe miosger bike. Em wan koçberan ji kampan û hewl didin wan tev li civakê bikin ji bo ku bi xwe debara xwe bikin û bikarên li derveyî kampan bijîn."

# Konfidralîzma Demokratîk şêwazekî Rêveberiya Xweser e

Hevseroka TEV-DEM Rûken Ehmed diyar kir ku Konfidralîzma Demokratîk şêwazekî Rêveberiya Xweser e, ku bi rêveberiya Îdarî ya ku bi riya Netew dewletê re nakokiyê dike, lê di hin şert û mercan de dibe ku ev herdû şêwe bi awayekî aşitiyane bi hev re bijîn.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Di sala 2016'an de çapa sêyem a pirtûka konfidralîzma Demokratîk a Abdullah Ocelan hat weşandin. Divê biroşûrê de Rêber Apo nêrîna xwe ya li ser pirsgirêka kurd û çawaniya çareseriya demokratîk vedibêje, isbat dike ku ev çareserî di formûla konfidralîazmê de cih digre.

Di derbarê guhrtina ku di TEV-DEM`ê de çêbûyî hevseroka TEV -DEM'ê Rûken Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

### TEV-DEM bingeha xwe ji ofîsan digre

Rûken Ehmed diyar kir ku TEV-DEM carek din li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sîwana, xwe bi vî rengî rêxistin dike û wiha got: "Ji ber ku kar û xebatên me berfireh bûn wek TEV-DEM` û li ser bingehê yekîtî û sendîqayan li Rojava hatin avakirin. Lê dema bajarên wek Reqa, Minbic û Tebqa jî hatin rizgarkirin li wir TEV-DEM wek Civaka Sivîl hat avakirin û bi vî rengî kar û xebat hatin meşandin. Di kongira çaremîn a TEV-DEM`ê de jî biryar hat girtin ku sîstema TEV-DEM`ê xwe bi rêxistin bike û sendîqa û yekîtiyên xwe berfirehtir bike. Her wiha li gor ofîsên rêxistinî, jin, ciwan, têkiliyên derve, aborî û şopandinên xwe birêxistin bike, lê pêwîstî hebû ku sîwaneke giştî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku hemû pêkhate cihê xwe di nav de bigrin were avakirin. Ji ber ku meclisa TEV-DEM`ê tenê ji kantona Şehba, Cizîrê û Kobanê pêk dihat. Kordînasyona meclisê jî ji nava meclisê hatibû hilbijartin û li ser esasê Rojava van yekîtiyan xwe bi rêxistin kiribû. Ji ber vê yekê diviyabû ev xebat bi rengekî berfireh xwe birêxistin bike. Di konferansa 4'emîn de biryar hat girtin û li ser vî esasî jî qomîtekî amadekar ji bo vê xebatê hat destnîşan kirin û di encama kongirekê de Kongira konfederal hat damezrandin."

### TEV-DEM hebûna xwe diparêze

Rûken Ehmed axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: "TEV-DEM`ê carek din ji bo xwe rêxistinkirinê hebûna xwe diparêze, meclîs, koordînasyon û ofîsên wê jî hene. Her wiha yekîtiyên ku xwe birêxistin kirin hemû di bin sîwana TEV-DEM`ê de ne, di rêziknameya konfidralî de yekîtî nîne, ji ber ku li ser ofîsan xwe birêxistin dike; wek ofîsa jin, ciwan, rêxistinî, şopandin, ekolojî, aborî û mafnasiyê, bingeha xwe ji van digre. Di koordînasiyona federal de hevserok hene û 4 cîgir û 31 endamên koordînasiyonê jî hene, ji van 31 endamî 15 jê girêdayî TEV-DEM'ê ne û cihî xwe di vê koordînasiyonê de digrin. Konfidralî sîwana hemû sazî û dezgehane, ji ber vê yekê kevirê esasî yê di konfedraliyê de TEV-DEM'e. Her wiha TEV- DEM di destpêka Şorşê de xwe birêxistin kiribû û di sala 2018'an û şûnde jî xwe li ser esasê sendîqa û yekîtiyan bi rêxistin kir û di heman demê de ji bo rêxistinkirinê bingehekî wê yê xurt hat avakirin. Qadên me berfirehtir dibin, ji ber ku yekîtiyên me li Minbicê heta Dêrazorê û Reqa û Tebqa jî hene. Di navbera TEV-DEM û konfedraliyê de koordînasiyon heye, biryarên bingehîn yên girêdayî herêmên Bakur û rojhilatê Sûrî bi tevahî dide, her wiha di Meclisa Konfidralî de pilansaziya salane tê girtin."

### Di TEV-DEM`ê de tu guhertin çênebûn

Hevseroka TEV- DEM'ê Rûken Ehmed dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: " Di heman demê de meclisa TEV-DEM jî her 4 mehan carekî civîna xwe çêdike, ofîsa wê ya rêxistinî jî mehê carekî dicive û biryarên girêdayî Rojava dide. Her wiha biryarên xwecihî û girêdayî kantonan didin. Ji beriya neha



TEV-DEM di Rojavayê Kurdistanê de kar û xebatên xwe birêve dibir û biryarên xwe di nava xwe de digirtin û pêktanîn, lê niha biryarên giştî yên ku girêdayî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di meclisa konfedralî de tên dayîn. Guhertinên ku îro roj çêbûyîn, ji ber ku TEV-DEM dema berê meclisa wê ji 80'î kesî pêk dihat û hemû ji Rojava bûn; endamên wê ji Heleb heyanî Dêrikê bûn, lê rêxistinên me li Minbic, Tepqa û Reqqa jî hebûn. Ji ber vê yekê nedibû ku ev rêxistin ji derve bimîne. Ev qad bi navê civaka sivîl bû, ev yek hat guhertin bû Rêxistinên Civaka Demoqratîk, niha li hemû alanan nav hat Guhertin ji ber ku sîstema me sîstema Netewa Demoqratîke, hemû di bin sîwana Netewa Demoqratîk de xwe bi rêxistin dikin, pêwîstî hebû ku ev guhrtin çêbibin. Di rêziknameya konfederiyalî de jî ev yek hat guhertin. Di sîstema TEV-DEM`ê de tu guhertin çênebûne lê sîwaneke giştî ji bona kar û xebatên sendîqayên civakî hate avakirin."

## 22'ê Nîsanê hat û hîn Silêman Ehmed revandiye!



**Dilyar Cizîrî**

Çend roj di navbera me û 22'ê Nîsanê salvegera 126'an a roja rojnamegeriya kurdî de maye. Bi vê boneyê hêjaye ku em bi bibîr bînin ku gelê kurd di warê ragihandinê de gavên mezin avêtine. Îro li ser hêmanê avakirina rojnameya Kurdistan ku bi destê Mîr Midhet Bedirxan ve hatiya vekirin, bi sedan sazî û dezgehên ragihandinê yên kurdî li ser asta her çar aliyên Kurdistanê hatine vekirin.

Bi hezaran kurd di hemû beşên ragihandinê de dixebitin. Di encamê de her çendî partiyên kurdî nikarin bi yek bin lê di warê civakî de yekbûyînek bi hêz a kurdistaniyan saz bûye. Ev di bûyera vê dawiyê ya li Balçîka, hilbijartinên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê û her wekî din de baş diyar dibe.

Bi wate her çendî kurt û kêmasiyên ragihandina kurdî, bê derfetî hebin jî lê gavên hatine avêtin qet ne kêm in. Bi saya ragihandina kurdî serkeftina şervanan li Kobanê di cîhanê de deng veda, bi saya ragihadina kurdî navendên şerê taybet ên dewletên dijminên gelê kurd naçin serî, bi saya ragihandina kurdî şoreşa Rojava bûye şoreşeke li ser asta cîhanî.

Îcar di rewşeke wiha de em behsa ragihandina xwe dikin, aliyekî bi navê kurdayetiyê hebûna xwe parastiye, kedkarên ragihandinê di zindanên xwe de dihêlin. Em fam dikin dewleta Tirk dijminê gelê kurd e û ji bo dengê rastiyê li Kurdistanê veşêre, bi dehan rojnamevanan binçav dike, saziyên ragihandinê digre.

Lê dema em li bûyera revandina Rojnamevan Silêman Ehmed meyze dikin ku bi destê hêzên partiyek bi navê kurdayetiyê bang dike, em matamyî dimînin. Îdaya wan a revandinê ew e ku Silêman Ehemed endamê PKK'ê ye. Bi rastî ev îda tiştekî sosrete, mane îro bi dehmilyonan kurd piştgiriya PKK'ê dikin. Mane ên Şengalê ku komkujiyên hîn mestir rizgarkirin endamên PKK'ê bûn, mane ên ne hiştin çeteyên DAIŞ'ê bighêjin Hewlêrê û benda parastinê li Mexmûrê ava kirin, gêrilayên PKK'ê bûn. Mane Serokê PDK'ê bi xwe li Mexmûrê çû serdana şervanên PKK'ê û spasiya wan kir.


Niha jî di bin navê endametiya PKK'ê de rojnamevanan direvînin û rê nadin ne malbat û ne jî parêzer wan bibînin. Heger bûyera girtina Rojnamevan Silêman Ehmed ne revandin be û çetetî be, bela rayedarên PDK'ê Silêman bînin pêşberî dadgehê. Mane qaşo li Başûrê Kurdistanê qanûn û dadgeh hene? Heger hene bila bixin piratîkê, na heger nîne, wê demê bila rêveberiya Başûrê Kurdistanê bi hemû aliyên xwe ve nebêjin em xwedî qanûn û destûrekî demokratîk in. Di heman demê de heger îro ajansa Anadol û bi dehan saziyên dewleta Tirk a ji bo qirkirina gelê kurd kar dike, li Başûr fermî dixebitin û rê nayê dayîn saziyekî wekî Ronahî Tv û saziyên din ên Rojavayê Kurdistanê li Başûrê Kurdistanê buroyên xwe vebike, bela rayedarên PDK'ê xwe di ber çavan re derbas bikin.

Bi boneya 22'ê Nîsanê gerek rayedarên PDK'ê li xwe vegerin û bi çavên serê xwe hêza gelê kurd bibînin çawa pergala Erdogan di hilbijartinan de şaş kirin, wê pergala her kesê dijberiya gelê kurd dikin, şaş bikin. Ji bo wê jî divê Silêman Ehemd di zûrtirn dem de were azadkirin.

# Çarçoveya têgînî.... desthilatdarî

**Ji remanê Rêber Apo**

Têgîna desthilatdariyê di serê wan têgînan de tê ku herî zêde di warê jihevderxistina rastiya civakî de rê li ber zehmetî, şaşî û nakokiyê vedike û mîna ku ji aliyê naverok û şêweyê ve ji bo neyê naskirin li ber xwe dide. Hakimiyeta di xwezaya wê de xwe di danasîna wê de jî nîşan dide, li hemberî danasîneke bi rastî li ber xwe dide, xwe nade dest. Mîna ku nutr e, lê dest jê nabe û fena diyardeyeke xwedayî xwe dike giştî û bi vî awayî xwe mutleq dike. Mirov dikare desthilatdariya civakî jî bi awayê herî rast weke mêtinkariya zêde ya ekonomîk û potansiyela hêzê (derfetên hêzê) bide naskirin. Desthilatdarî potansiyela hêzê û mêtinkariya mîna genetîkê (mîna DNA'yê) bûye xwedî karektereke kombûyî ya di tevahiya çaviyên civakê yên mejî û avahiyên wê de ye, hêzên civakî yên ev mekanîzmaya desthilatdariyê xistine destê xwe jî bi awayekî berbiçav dewleta dîrokî, elîtên mêtinkar û çînên wan pêk



tînin. Gelekî girîng e ku mirov desthilatdariyê timî weke derfeta kanên potansiyela pêkhatinên dewlet û çînan fêhm bike. Kengî potansiyela desthilatdariyê berbiçav dibe, her çi dewlet û elîta hukim lê dike çîna mêtingeh a civakî ya xwe disipêrinê (koledar, feodal, bûrjûwa û hwd.) pêk tînin. Mirov dikare desthilatdariyê hem fizîkî, hem jî weke potansiyela hêzê ya entelektuel jî bifikire. Li ser civakê xwe weke hewcedariyekê, mutleq û domdar ferz dike. Yek ji sedemên din ên girîng ê vê yekê jî ew e, xwe bi pêdiviya rêveberiya xwezayî ya civakî re wekhev dibîne. Kengî desthilatdariyê xwe bi diyardeya rêveberiyê re kir wekhev, hingê xwe dike ku dest jê nebe. Dema ku desthilatdarî ji pêşengiya civakî ya xwezayî hat veqetandin, wê baş were dîtin ku desthilatdarî çawa weke girêkeke kansêrê çiziriye binyeya civakî û lê belav bûye.

Girîng e ku mirov cudahiya di navbera dewlet û desthilatdariyê de jî bibîne. Desthilatdarî li civakê zêdetir belav e, û ketiye tevahiya çaviyan, lê dewlet nasnameyeke desthilatdariyê ya bêhtir teng û bi pîvanên berbiçav îfade dike. Dewlet şêweyekî desthilatdariyê ye, zêdetir di kontrolê de ye, bi pîvanan ve hatiye girêdan, her diçe huqûqî dibe û di warê xwerewakirinê de nazik tevdigere. Mirov dikare desthilatdariyê weke rewşa hukimraniyeke giştî binirxîne û ji bo rewşa bêdesthilatbûnê jî mirov dikare weke koletiya giştî hukim bide. Şêweyên koletî û desthilatdariyê yên cuda bi xisletên giştî yên dewletê ve girêdayî ne, û ji wê feyza xwe digirin. Mirov dikare li ser wan weke dijberê azadiyê hukim bide. Di civakê de çiqasî potansiyela desthilatdariyê hebe, ewqas jî civak ji azadiyê bêpar dibe. Desthilatdarî çiqasî were kêmkirin, ewqasî rewşa azadiyê pêş dikeve. Divê mirov gelekî hay ji hesreta ji bo desthilatdariyê ya di nava civakê de hebe. Ev hesret û bêrîkirin çiqasî belav be, ewqas jî wê despotokên civakî zêde bibin. Ev jî dikare bi tevahî demokrasiyê biqedîne. Despotî nexweşiyeke desthilatdariyê ye. Kengî li derveyî kontrolê bimîne, çawa di mînaka Hîtler de jî hat dîtin, dikare har bibe û bibe cinawirekî serî pê re derxistin zehmet be. Despotîzm di dîrokê de ji nava şêweyên rêveberiyê yên keyfî derdikeve û weke girêkên faşîzma civakî bi cih dibe. Di pêvajoyên desthilatdariya kapîtalîzmê de dikare bi lez mezin bibe, li tevahiya çaviyên civakî belav bibe û weke rêveberiya hêza totalîter a civakê bi gewde bibe. Şêwegirtina desthilatdariyê bi awayê dewleta netewe têkiliya xwe bi rejîma kapîtalîst-faşîst re heye û rewşa wê ya pêşek îfade dike.



# 'Pêwîste em li hemberî madeyên hişbir civaka xwe biparêzin'

Yek ji lingên bingehîn yên pêkanîna siyaseta şerê taybet di nava civakan de; Belavkirina madeyên hişbir e. Bi taybet belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de rê li ber Otoasîmîlasyonê vedike. Yek ji endamên rêveber yên Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya Kantona Efrîn û Şehbayê Beşar Îsmaîl diyar kir ku malbat yekemîn hêze ku rê li ber diyardeya madeyên hişbir bigire.

**Zana Roj/ Şehba**

Dijminê mirovahiyê û sîstemên sermaye bi hemû hêz û tektîkên xwe li ser valaderxistina cewherê ciwantiye û yê civakan dilîzin. bi pêşketina zeman re mejî û hişmendiya ciwanan jî ferehtir û mezin tir dibe. bi vê yekê hêza ciwantiyê dikeve herikînê û têgiştina siyaseta ku gerdun, mirovahî, dewlet û malbat tên birêvebirin zelal dibe. hêzên kapîtalîzmê bi teknîk û rêbazên gelek zirav pilana pûçkirina hêza herikî ya ciwantiyê dikin. bê guman ev yek bi awayekî tê pêşxistin ku di şaneya herî biçûk di mejiyê mirov de xwe bi cih bike û bêyî ku em bizanibin ev tiştekî şaş e.

Yek ji siyasetên ku ji aliyê hêzên gilobal de hatiye pêşxistin bikaranîna madeyên hişbir e. Madeyên hişbir dihêle ku zanebûn, hêz, enerjî, fikirandin û hebûna te bi demê re bê pûç kirin. Ev siyeset ji aliyê hêzên kapîtalîst ve bi tayebet hat pêşxistin da ku hêza ciwantiyê û ya fikrandinê nahêle biherike û tevbuugere. Weke bendek li pêşiya mejiyê mirovahiyê hatiye avakirin. Her wiha ev rêbaz xwe disipêre siyseta Şerê Taybet.

Dijminê gelê Kurd vê siyasetê li ser gelê Kurd dide meşandin. Bi pêkanîn û belavkirina siyasetên şerê taybet di nava ciwanên Kurd de dixweze armanc û pilanên xwe pêk bîne. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê her wiha li herêma Şehbayê diyardeya belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de pêşketiye, her çiqas kêm be jî lê divê pêşî lê bê girtin. Li hember vê yekê tavahî civak û tevgerên ciwanan û bi taybet Hêzên Ewlekariya Hundirîn xebat didin meşandin û oparasyonan pêk tînin.



Têkildarî mijara belavbûna diyardeya Madeyên Hişbir di herêmê de yek ji endamên rêveber yê Hêzên Ewlekariya Hundirîn beşa dij madeyên hişbir Beşar Îsmaîl ji rojnameya ne re axivî.

### Bandorkerên yekemîn Ciwan in

Beşar di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku beşa herî zêde di civakê de hatine hedef girtin beşa ciwantiyê ye û wiha axivî: "Di giştî cîhanê de hejmara herî zêde ji madeyên hişbir bandor dibe beşa ciwana ye. bê guman ev yek bi zanebûn ji aliyê dijmin ve tê kirin. Li gorî lêkolîn û xebatên ku ji aliyê me de hatine pêşxistin, hat dîtin ku li herêma Şehbayê qismek ji ciwanan ber bi bikaranîna madeyên hişbir ve diçin. Heyanî niha hejmar tam nehatiye tesbît kirin, lê rûxmî ku herêm ewqas biçûke lê rêjeyekî bi vî awayî me hêvî nedikir".

### Armanca dijmin ji belavkirina madeyên hişbir

Her wiha Beşar armanca dijmin ji belavkirina vê made xuya kir û wiha domand: "Ji 6 salan ve em bi hemû îrade û hêza xwe li herêma Şehbayê ne tenê jiyan dikin em rojane kêliyên berxwedanê dinivsînin. Dijminê gelê Kurd di serî de faşîzma Tirkiyê piştî koçberiyê heyanî vê kêliyê bi hemû hêza xwe êrîşê hêza leşkerî û sivîlan dike. Di heman demê de Hikumeta Şamê bi heman awayî siyaseta dorpêçê dide meşandin. armanca wan herduyan jî yek e. di asta yekemîn de îrade û hêza Rêveberiya Xweser û ya gelê têkoşer pûçbikin her wiha derî li koçberiyê û valakirina herêmê bê vekirin. her du alî û hemû parastvanên berjewendiyên xwe di herêmê de ji sedî 5 jî encam negirtin. Ji lewra êdî dest bi meşandina şerê taybet hatiye kirin. Ev siyaseta belavkirin û derbaskirina madeyên hişbir li hemû herêmên Rêveberiya Xweser pir zêde hatiye belavkirin. Bi vê yekê dixwazin naveroka civakê ji ciwanan bigire vala bikin. her wiha talankirina civakê û avakirina kesayet û civakek pûç û vala hêvî dikin. Ev yek bi heman awayî li herêma Şehbayê jî tê pêk anîn".

### Bandora bikaranîna madeyên hişbir li ser tenduristiyê

Beşar bal kişand li ser bandora bikaranîna madeyên hişbir di aliyê tenduristiyê de û wiha pê de çû: "Dibe ku di destpêkê de weke hestên kêfxweşiyê avabike, lê di cewher de ew dibe weke jehir û di şaneyên laşê mirov xwe bi cih dike. her wiha ev yekser bandora xwe li ser mejî, hêza fikirandinê û piskolojiya mirov dike û nahêle ku mirov bi tiştekî din ji derveyî çawa bidest bixe û kêfxweş bibe bifikir e. di heman demê de bandora xwe li ser nefesstandinê jî dike. Bê guman li gorî giranbûna cureyên wî bandora xwe girantir dibe".

### Kampaniya ji bo hişyarkirina civakê ji madeyên hişbir

Beşar anî ziman ku me bi aliyên têkildar re dest bi kampaniya hişyarkirina civakê kir û wiha domand: "Beriya demekê li herêmê dest bi kampaniya hişyar kirina civakê û bi taybet ya ciwanan hat kirin. di nava vê kampaniyê de TEV- DEM, Desteya perwerê, Yekîtiya Rewşenbîran û hêzên dij madeyên hişbir cihê xwe tê de girtin. Kampaniya ji her pênç kampan ve hat destpêkirin, li hemû kampan hat gerandin her wiha hişyarî û perwerdeyên girêdayî zirara van madeyan ji bo malbatan hat pêşkêş kirin. ya din di dibistanan de xebatê hişyarkirina xwendekaran hat meşandin. di heman demê de li hemû meclîs û komînan ev xebat hat meşandin".

### Parastina civak û ciwanan erka me ye

Beşar di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku malbat çare û alîkarê yekemîne ku rê li pêşiya van diyardeyan bigire û wiha got: "Malbat ji bo pêşîgirtina li hember van diyardeyan alîkarê yekemîn ji zarok û ciwanên xwe re ye. bi riya hişyarkirina malbatê em dikarin diyardeya bikaranîna madeyên hişbir kêm bikin. divê malbat baldar be li ser zarokên xwe di temenê ciwantiyê û nûtêgihiştinê de, ji ber temenê herî zêde bi van polîtîkeyan bandor dibin ew in. Her wiha bangewaziya me ji hemû civakê û ciwanan re di heman demê ji tavahî sazî û rêxistinên me re heye ku bi me re û bi ciwanên xwe re bibin alîkar da ku em civaka xwe ji van qirêjiyan biparêzin".

## Rojhilata Navîn difûre



**Zekî Bedran**

Îranê karî piştî du hefteyan bersivê bide êrişa Îsraîlê ya li ser nûnertiya xwe ya li Şamê. DYE û Îsraîl kadroyên bi bandor ên Îranê armanc digirin. Beriya niha Qasim Silêmanî li Bexdayê ji aliyê DYE yê ve hatibû kuştin. Vê carê jî li sefaretxaneya li Şamê Mihemed Riza Zaherî û komek Îranî hatin armanckirin. Ji bo Qasimî jî Îranê bersivek hemahengê wê nedabû. Çend moşek avêtin baregehên DYE yê, lê baldarbû ku pir zêde windayiyek canî çênebe û ji beriya êrişê ew agahdar kiribûn. Vê carê rewş hinek cudatir bû. Êrişên ku Îsraîl li ser Xezayê pêk tîne û qetilkirina bi dehhezaran sivîlan welatên weke Îranê xiste bin zextê. Îran bixwe li kêleka Filistînê nekete şer. Di qadên şer de Filistînî bi tena serê xwe man. Yên ku herî zêde diaxivîn û digotin emê piştgiriyê bidin rêveberiya Îranê û Erdogan bûn. Lê Erdogan bazirganiya xwe ya bi Îsraîlê re jî ranewestand.

Heman demê de Îsraîlê di axa Îranê de, yanî di avahiya sefaretxaneya wê de lê da. Istixbaratên bi bandor girt û li kadroyên wê yên bi bandor da. Îranê nedikarî van bi daxuyaniyan derbas bike. Lê şerekî berfireh jî nedida ber çavan. Eger şer bidaba ber çavan ev bi mehane komkujî ji dûr ve temaşe nedikir. Di 14'ê Nîsanê de, piştî nîvê şevê ragihand ku êrişek bi moşek û balefirên bê mirov li dijî Îsraîlê da destpêkirin. Mûşek û balefirên bê mirov wê bi çend demjimêran piştî daxuyaniyê bigihana armanca xwe. Yanî Îranê ji beriya wê DYE û Îsraîl agahdar kir û hişt ku bergiriyê bigirin. Ji cîhanê re ragihand ku armanca êrişê ne destpêkirina şer e, bersiva êrişa li Şamê ye. Îsraîlê ragihand ku bi parastina hewayî ev êriş bêbandor kiriye.

DYE û Îranê ragihandin ku naxwazin şerê li Xezayê belav bibe. Îran bixwe nekete şer lê bi komên girêdayî xwe li gelek cihan êrişî baregehên DYE yê kir. DYE yê bersiv da van êrişan. Got di pişt van koman de Îran heye. Îranê ev êriş negirtin ser xwe. DYE yê li Bexdayê li navenda Heşd Şebî da. Îranê tektîka rageşiya bi venêrîn hilbijart. Dema nekarîn tevgera Hûsiyan rawestînin, DYE û hevkarên wê Yemen bombebaran kirin.

Dema ku Îranê dît rewş ji bin venêrînê derdikeve û dibetiya êriş ber bi wî ve herin, derbasî rewşek agirbestê bû. Eger DYE li bênder û cihên wê yên stratejîk bide wê aboriya Îranê zirarek mezin bibîne. Jixwe rewşa wan a aborî nebaş e. Di dorpêçê de ye. Îran di nav xwe de jî ne rihet e. Li gel ku DYE şeytanî kir, li ser ol propoganda kir û pergala zextê xiste dewrê jî, gel dest ji daxwazên xwe yên azadiyê bernadin. Îran serhildanên gel bi zext û tundiyê diperçiqîne. Îcar şerek nû, wêraniya aborî wê ji aliyê gelan ve çawa bê pêşwazîkirin? Ma wê gel pişta rejîmê bigire. Mîsogeriyek wiha tune ye. Di vî alî de rêveberiya Îranê baldar nêz dibe Îsraîl di pişt êrişên Hemasê de Îranê dibîne. Di vî alî de hewldide ku Îranê bikişîne nava şer û ji bo vê jî tu pirsgirêkê nabîne. Îsraîl dixwaze ev şer belav bibe û Îran jî bikeve nava şer. Difikire ku eger Îranê bikişîne nava şer wê DYE jî bikeve şer. Netanyahû dibêje ku ew hertim Îranê ji xwe re weke gefek mezin dibînin. Rêveberiya DYE yê jî îlan dike ku wê Îsraîlê li hemberî her cûr êriş biparêz in. Li herêmê cemserbûnek diyar heye, alî kêm zêde diyar in. Jixwe Îsraîl di şer de ye. Guhê xwe nade nerazîbûn û bangên ku ji cîhanê tên. Dibêje ezê Hemasê tune bikim û Xezayê bidest bixim.

DYE û welatên Ewropayê guhê xwe ji bangên agirbest û aştiyê yê ji gelê cîhanê û raya giştî tên re girtine. Ji bo bertekên gelê wan li wan nezivirin gotinên weke "bila sivîl nemirin" dibêjin. Bi vî awayî dibêjin ku ne li dijî agirbestê ne. Lê helwestek ku Îsraîlê neçarî agirbestê bike nîşan nadin.

"Rêberê mezin, rizgarkerê mezin" Erdogan jî herî dawî neçar ma bazirganiya xwe ya bi Îsraîlê re bîne ziman. Biryarên ku girtine dawî li bazirganiyê nayînin. Heta ku Îsraîl agirbestê bipejirîne navber dane bazirganiyê! Rojên Erdogan ên "One Minute" pir di paşerojê de mane. Demekî bi van xwezirtkirinan rayagiştî mijûl kir, lê ew poşman kirin. Piştî wê Erdogan çû DYE yê, ji bo rêberên Yahûdî re navbera xwe xweş bike bendbazî kirin. Ji bo têkiliyên bi Îsraîlê re sererast bike pir hewl da. Serokkomarê Îsraîlê vexwend Tirkiyê û pêşwazî kir.

Tirkiye yek ji wan hêzane ku aştiya li Sûriyê asteng dike. Pişta xwe daye NATO û DYE yê û dixwaze li herêmê serweriyê çêbike. Bi dijminayiya Kurdan û wêjeya terorê di axa Iraq û Sûriyê de pêş diçe, dixwaze herêmên dagirkirî berfireh bike. Îran jî bi dijberiya Îsraîlê û komên girêdayî xwe li Rojhilata Navîn hewldanên xwe yên hêzek serwer didomîne. Li herêmê lêgerîn û rikberiya serweriya Îran û Tirkiyê heye. Niha jî yên tên qetilkirin, wêrankirin û di xeteriyê de Kurd û Filistînî ne. Hêzên din ên mezin jî di vê lîstokê de li gorî berjewendiyên xwe cih digirin.

## Manevrayên xeternak



**Farûk Sakik**

Di 1'ê Nîsanê de Îsrail li dijî Balyozxaneya Îranê ya Şamê êrişek pêk anîbû. Herkes li bendê bû ku wê Îran bersivek-misîlemeyek çawa bide. Bersiva vê meraqê, Îranê di şeva 14'ê Nîsanê de bi sedan fuze û Dronan ber bi Îsraîlê ve rêkir. Rêwîtî û aqûbeta van fuzeyan jî zelal nebû.

Hemû nirxandin û analîz li ser kêliyên ku ev fuze li asîmanan bûn, hatin kirin. Manşêtê xwe jî avêtibûn: Şerê Îran û Îsrail dest pê kir. Herkesî heta saetên şevê yên dereng ev tetbîqat-anîmasyon şopandin. Dema ku ev fuze hîn negihîştin hedefên xwe razan. Dema sibehê şiyarbûn, gotin herhalde me xewin dîtiye. Çi zahiyat da Îsrail nedihat dîtin. Kê der bombardûman kiribû, dîmen tunebû. Rast bû me xewin dîtibû û ev ne şer bû.

Şer çi ye? Bersiva vê têgehê herî baş Kurd dizanin. Li ser axa Kurdistan her dem şer hebû. Kurd ji ber şerê li ser axa wan diqewimin gelek êş û elem kişandibûn.

Şer dema ku balafirên dewleta Tirk li ser asîmanên Kurdistan dest bi bombebaranê dikin. Dema ku li jor herêmên sivîl tên bombekirin û li jêr ambûlans birîndaran ber bi nexweşxaneyan bi rê dixin û cesedên zarokan ji bin kavilan tên derxistin, şer dibe şer. Rast e şer dema du alî werin beremberî hev dibe şer. Di vî şerî de, li aliyek dewleta Tirk li aliyek jî wijdana mirovahiyê hebû. Ango Tirk li dijî mirovahiyê şer dikirin. Li cîhanê şerên ku diqewimin, demî û lokal in. Biçûk in. Zahiyatên wan pir kêm in. Blof in. Mîna dîkan xwe ji hev re berz dikin, lê newêrek in û şer nakin. Me dît rojek piştî vê bûyerê dest bi senoryayên îhtimala ku wê ev şer dewam bike, kirin. An jî çima navber dane kirin. Amerîka wiha got, Îsrail wiha got. Bi van gotinan şer nayê tarîfkirin û analîz kirin. Ha, wê were pirsîn ka Şerê Sêyem ê Cîhanê destpêkiribû. Rast e di vî şerî de hêzên moderînîteya kapîtalîst ji bo ax bi dest bixin, sînorên dewleta xwe berfireh bikin, di nav hewldanan de nînin. Ev şer, şerê parvekirina kapîtal e.

Şerê wan li ser kapîtal ango li ser kartel, şîrket û holdînga tê kirin. Di vî şerî de her dewlet dixwaze xwe îspat bike, xwedî teknîkek çawa ne, xwedî çiqas makînên kincşûştinê ne, çiqas wesayit hilbirandine, di dest wan de çiqas çek hene. Bi tenê hêza xwe îspat dikin.

Rastiyek din a vî şerî, li ser êş û axa gelên heremê tê birêvebirin. Di dema efektên şer ên wiha de, di nav gelên blindest de heyacanek peyda dibe. Ji bo vê yekê ew şev, tiştek pir balkêş û girîng hebû. Dema ew fuze di rêwîtî û rotaya ber bi Îsrailê de bûn, li kolanên Îranê, gelên Îranê yên di bin dîktatoriya rejimê de dihatin peliçiqandin, di nav hêviyên azadiyê de bûn.

Li kolanên Îranê, ew dengê 2 sal berê yên "Jin Jiyan Azadî" dîsa bilindibû. Di medya dijîtal de parvekirin û şîroveyên şibandina têkçûna Sedam û dîktatorên dinan dihat kirin. Kelecanek hebû.

Em piştî demek razan, lê ew gelên herêmê heta sibê di dewsa xewê de, di xeyalên azadiyê de bûn. Îran divê ew dengê li kolanan bilid dîbe bibihîze û bersivê bide. Ev şanoya bersivdayina Îsrail, rejîma wan a zilimkar li piyan nahêle. Divê di serî de li pêşiya daxwazên azadiya Kurdan û gelên li Îranê dijîn nebe asteng. Îran bi tenê bi azadiya gelan re dibe hêz.

Deng û bandora ku ew şev li kolanên Îran bilind bû, ji dengê Fuze û Dironên we bi bandortirin.